Gotegoteyî

hatırlamak
ve anlatmak
için şehre

BAK

Li Bajêr Binihêre, Ji Bo Ku Tu Di Bîr Bînî û Bibejî
Kargeha Hilberîna Vîdeoyan a Kolektîf a Gotegoteyî
Tîrmeh 2020 - Avrêl 2021

Beşdar Aylin Kızıl (Amed), Berivan Bagı (Mêrdîn), Berivan Karatorak (Amed), Evindar Tokur (Amed), Fatma Çelik (Amed), Fatoş Güneri (Amed), Mediha Güzelgün (Mêrdîn), Nalin Acar (Êlih), Rozerin Tadik (Amed), Semiha Yıldız (Amed), Sibel Öğe (Êlih), Zelal Sadak (Amed)

Şêwirmend Ayça Çiftçi, Sevgi Ortaç

Ekîba Projeyê Bilge Işık, Övgü Gökçe Yaşa, Diyarbakır Sanat Merkezi
Vîdeo Pevbestin Felat Erkozan, Melis Bider
Sêwirana Deng & Mîksa Dawî Başar Ünder, Ozan Hatipoğlu, Özgehan Özturan, Resul Keleş
Serastkirina Reng, Jenerîk, Jêrnivîs Felat Erkozan
Wergerên Jêrnivîsan Mem Wenda (Kurdî), Su Baloğlu (Îngilîzî)
Vîdeoya Danasînê Felat Erkozan, Bilge Işık

Pirtûkçeya Bernameyê
Metn Beşdarên Kargehê, Ekîba Projeyê û Şêwirmend
Sêwirana Dîtbarî Arican Paker
Sêwirana Bergê Pirtûkçeyê Gözde Onaran
Wergerên Pirtûkçeyê Samî Hêzil (Kurdî), Deniz İnal (Îngilîzî)

Spasdarî Lal Laleş, Berke Baş, Aylin Kuryel, Senem Aytaç, Hazni Demir, Asena Günal, Latife Uluçınar

FÊRHÎST

Pêşgotin 5

Projeyên BAK’ê

- Fotoname 8
- Pîrê Zekî 11
- Pêkan e 14
- Derî 17
- Mehla Qorê 20
- Çemberekê Bîne Ber Çavên Xwe 23
- Feza, Fehmi û Razên Bajêr 26
- Kevir û Av 29
- Nisêbîn,4 Berfanbar 2020 32
- Cûdîyê Miradan 35
- Li Vir 38
- Eşêfçî, Xewn û Pincar 41

GOTEGOTEYÎ

Gotegoteyî, leyîzek li ser esasê gerandina yek hevokê ya li hundirê çemberekê ye ku herkesî kêmtirîn yek carê di zarokatiya xwe de leyîstiye. Hemû leyîzvan hevokê ji kesê kêleka xwe re bi tenê dikarin yek carê û bi awayekî herî bêdeng bibêjin. Her ku rewş wiha ye, ji ber qutbûnan û fêmkirinên xelet di dawiya leyîzê de dibetiya bihîstina peyveke cipcuda pir zêde ye. Kêm an zêde herkesê ku beşdar dibe dizane ku peyva ew dibêje dibe veguhere wate û şêweyeke gotinê ya tewş. Bedewiya leyîzê jî tev jixwe di vê niqteyê de ye. Ew performans tev bala xwe dide li ser dilxweşiya di yek hengavê de. Çav gir dibin, dev fireh dibin, sûret vedikêşin û hîqehîqeke bilind diqewime.

Fikra ji vê kelecanê derket holê ku, ji zarokatiya me heya roja îro, çîrokên ku me guhdarî kirine û vegotine ji me re wek deriyên ku di nav dem û şûnwarê re dişimitin derfetên gavişkî yên derbasbûnê çêkirin. Me xwest em bi pistepista jinan bidomînin di gerdûna wan hîs û ceribandinan de ku vegotinên serwer ên derbarê bajêr ew tepeser û kerr kirine. Bi beşdariya 12 jinên ku li Amed, Êlih û Mêrdînê dijîn û li gel hemû cudatiyên xwe bîreke kolektîf û cîhaneke hevpar a ceribandinê bi par ve dikin, me xwe avêt nav serpêhatiyekê li pey pirsa 'bê ka em ê vegotinên edetî çawa bi hev re bitewînin.' Gelo pêkan e ku mirov, bi vegirtina hêza ji hev, wêrekiya bikerbûna veguherînê ya di çîrokê de li rexê barê şahidiyê an jî li lezgîniya dîtbarkirina tiştên ku dîtî zêde bike? Li dewsa vegotinên gewre, bişemate û dorgir, gelo mirov bikeve li pey çîrokên ku bi gotegoteyî vediguherin, azad dibin, bi kêfxweşiya leyîzê û bi qurfbariya likumînê zêde dibin, dê bikare derfeteke bêhnhildanê çêbike? Fîlmên Gotegoteyî, dixwaze kelecana mezin a ku ji hilberîna bi hev re çêdibe ber bi temaşevanan fireh bike, û herkesî vedixwîne ku li ser wan pirsan bi hev re bifikirin û bi hev re xeyalan çêbikin.

LI BAJÊR BINIHÊRE, JI BO KU TU DI BÎR BÎNÎ Û BIBÊJÎ

Li Bajêr Binihêre, Ji Bo Ku Tu Di Bîr Bînî û Bibejî, di sala 2012'an de ji hêla Anadolu Kültür ve wek bernameyeke hilberîna çandî û hunerî ya ku ciwanên ji bajarên cuda anî li ba hev û ji navenda Stenbol-Amed dihat rêvebirin dest pê kir. Di maweya pênc salên li pey damezrandinê de, naverok û rêbaza bernameyê li gel ekîbên docİstanbul – Belgesel Araştırmalar Merkezi û Geniş Açı'yê hat sêwirandin ku di qada fotograf û vîdeoyê de şêwirmendiya BAK'ê dikirin. Di sê pardemên cuda yên bernameyê de bi tevahî ji 12 bajaran 60 ciwanan bi hev re xebatên fotograf û vîdeoyê hilberandin ku di wan de çîrokên ji bajarên xwe vegotin. Ji 200'an zêdetir ciwan beşdarî perwerdehiyên BAK'ê bûn û bi hezaran temaşevan li pêşengeh û bernameyên pêşkêşiyê ku tê de karên BAK'ê hatin nîşandan pêrgî bi wan çîrokan bûn. Li bajarên cihê saziyên fermî, saziyên çandî û kolektîf di nav salan de bûn hevparê kelecana BAK'ê, mazûvaniya kargeh û perwerdehiyan kirin. Wênekêş, sînemavan, hunermendên rojanewer, akademîsyen wek perwerdekar beşdarî ekîba berfireh a BAK'ê bûn. BAK bi eleqe û coşa vebêjên ciwan ên çîrokan mezin bû û bi hêviya zêdekirina hîn bêtir a bihevrebûna dengên cihê di sala 2017'an de veguherî platformeke navtorê ya bi navê **sehrebak.org** ku dîsa ji hêla Anadolu Kültür'ê ve tê rêvebirin. **sehrebak.org**'ê ji aliyekê ve bi weşandina vexwendinan vegotina çîrokên dîtbarî yên ji bajarên cihê teşwîq kir, û di heman demê de wek platformek jî hat sêwirandin ku tomargeheke çavkaniyên ku ji metnên werger û rexneyî yên derbarê fotografa belgeyî û vîdeoyê pêk tên pêşkêşî bikarînerên malperê dike. Di malperê de her ku vexwendinên weşandî û pêşengehên navtorê yên derheqê mijarên wek koçberî, xwemalî, cihêrengî, ekolojî, veguherîn û jiyana rojane berdewam dikin, bi baweriya ku hevdîtinên rû bi rû ji bo nîqaş, hînbûn, kifşekirin û hilberînê jêneveger in di bin sernavê Hevdîtinên BAK de pêkanîna kargehên perwerdehî û hilberandinê didomîne.

Di çarçoveya **Li Bajêr Binihêre, Ji Bo Ku Tu Di Bîr Bînî û Bibejî** navbera Tîrmeh 2020-Avrêl 2021'an Kargeha Hilberîna Vîdeoyan a Kolektîf a Gotegoteyî bi rêveberiya **Navenda Hunerê ya Amedê** û bi piştgiriya **Institut français de Turquie** û **Anadolu Kültür**'ê pêk hat.

hatırlamak
ve anlatmak
için şehre BAK



Fotoname



Derhêner Aylin Kızıl
Vîdeo, 6’33”, Reşemî 2021
Amed

Fotoname (Fotoğraf Altı), ji banê bilind ê Apartmana Helînê, yê ku ji jor ve Bircên Amedê û dorhêla wê radigire, ber bi taxên bajêr dinihêre ku piştî hilweşînê ji nû ve hatine avakirin û hergav li hember dibetiya hilweşînê ne. Fîlm rêwîtiyeke kurt a dengeke jor e ku hewl dide bibe serwerê îmajê, û diherike ber bi gewdeyeke ku dike dibe beşeke wateyê û bigihîje wargehekê.



aykizil@gmail.com

Aylin Kızıl

Di sala 1988'an de li Amedê ji dayîk bû. Ji Fakulteya Dermankarî ya Zanîngeha Eskişehir Anadolu mezûn bû. Di sala 2012'an de beşdarî Ajansa Wênekêşiyê ya bi navê NarPhotos bû. Ew di warê wênekeşîya belgeyî de berheman hildiberîne û bi giştî derbarê mijarên wekî veguherîna bajarî, nasname, zayenda civakî û koçberiyê xebatên wênekêşî û vîdeoyê pêk tîne. Di sala 2017'an de li gel Serdar Bayram û Lezgîn Kanî derhêneriya belgefîlma kurt a bi navê **Miraz** kir û di sala 2020'an de jî li gel Fatma Çelik'ê derhêneriya belgefîlma kurt a bi navê **Bir Tribün Hikâyesi** kir.



Pîre Zekî



Derhêner Berivan Bagı
Vîdeo, 6’36’’, Reşemî 2021
Mêrdîn

Di **Pîrê Zekî** de, Berîvan û dapîra wê bi rêya kamerayê dest bi axaftineke xweşik dikin û cîhana rengîn a dapîrê bi kêfxweşî ji temaşevanan re didin naskirin. Pîrê Zekî, a ku li gundekî Merdînê li maleke bi baxçe dijî, ardê xwe dakutaye û bêjinga xwe hilawîstiye, bi gustîl û bazinên xwe, bi rihanên nav baxçeyê xwe, bi dîzikên tirşînên xwe û bi parçeyên jiyanê yên ku dîwarê hişbir ê salonê dinexşînin li gel Berîvanê me jî dike mêvanê cîhana xwe.



bagiberivan@gmail.com

Berivan Bagı

Di sala 1991'an de li Mêrdînê ji dayîk bû. Ji Beşa Ziman û Wêjeya Tirkî ya Zanîngeha Pamukkale mezûn bû. Li Zanîngeha Mardîn Artuklu di Beşa Ziman û Çanda Kurdî de lîsansa bilind timam kir. Li Mêrdînê di saziyên civaka sivîl de xebatên têkildarî zarok û jinan dimeşîne. Di pêşengeha navtorê ya bi navê "Sarı" de, ku li sehrebak.org di sala 2020'an de weşiya, xebateke wê ya ji çar dîtbariyan pêk tê jî cih girt.



Pêkan e



Derhêner Berivan Karatorak
Vîdeo, 4’11”, Reşemî 2021
Amed

Li wir, di bin sîya wan daran de ez xwe dirêj bikim? Pêkan e? Zêde pêkan xuya nake ji bo jinên ku hewl didin ji diltengiya bajêr bi dûr bikevin, aramiyê di xwezayê de bibînin. **Pêkan e** xewneke rewneqî ya rojeke ketûber e ku li Amedê di navenda nîqaşên mirasa çandî û ekolojiye de ne derbas dibe. Rojek wisa ku jinek bi diltengiyê, bi mereqê, bi dansê û bi lêgerînan dikare bêhna xwe hilde...



berivankaratorak@gmail.com

Berivan Karatorak

Di sala 1990'an li Şirnexê hat dinê. Di Beşa Radyo Televîzyon û Sînemayê ya Zanîngeha Kocaeli de xwendina xwe didomîne. Ji sala 2018'an û vir ve li Amedê dijî û di qada medyayê de dixebite. Li Komeleya Lêkolînên Kurdî perwerdehiya rêzimana Kurdî wergirt. Ji sala 2016'an û pê de beşdarî xebatên Kurdî dibe û wergeran dike.



Derî



Derhêner Evindar Tokur
Vîdeo, 7’19’’, Reşemî 2021
Amed


Derî (Kapı) ji hewldana rûberîbûna li gel bajêr dikeve ser rê da ku êşa bêdawî ya kuştinên kiryar nediyar û koçberiya bizorê aram bike. Fîlma ku li Ameda îro li paşerojê digere, her ku dide li pey şopa zarokatiyê, hêlînê û warên windakirî, hewl dide ku dîroka şexsî û bîra kolektîf bi hev ve bigire. **Derî** ya ku hem hevokên hêrsê, hem yên şînê û hem jî yên xatirxwestinê saz dike, li şûna bîra sûceke tarî, azweriya qencbûnê ya ku jiyînê tîne hişê mirov bi cih dike.



evindartokur@gmail.com

Evindar Tokur

Di sala 1986'an li Farqîna Amedê hat dinê. Di sala 2012'an de ji Beşa Avahîsaziya Peyzajê ya Zanîngeha Ege mezûn bû. Ji sala 2013'an heya îro bi nasnameya xwe sêwirîneriyê bi awayekî çalak xebatan dike. Di qada xebat û polîtîkayên jinê de ku girêdayî Şaredariya Mezin a Amedê ye bi dilxwazî xebat meşandin. Di sala 2019'an de wek beşdara Kargeha Diyarbakır A4 beşdarî hin çalakiyên hunerî bû û fîlma xwe ya yekem a anîmasyoneke kurt bi navê **Mase** çêkir. Ev fîlm li A4 Atölye û li Depo İstanbul di çarçoveya pêşengeha **Diyarbakır Peşrevi Eşliğinde Beraber Ve Solo (Li Ber Pêşreva Amedê Bi Hev Re û Solo)** de hat nîşandan.


→ gawur mahallesi
(Gawur mahallesi instagram hesabından fotoğraf alınacak)
→ 'ji bo azadiyê' sur filmi
→ marifet yerpe eski fotoğraflar
Mehle qore
~1989
leylek bahçesi

Mehla Qorê



Derhêner Fatma Çelîk
Vîdeo, 8’24”, Reşemî 2021
Amed

Mehla Qorê, ji bîranîna yekem a Fatmayê dest pê dike û taxa ku zarokatiya wê tê de derbasbûyî ji nû ve saz dike. Fîlma ku wêneyên taxa ku li pêvajoya bipevçûn ya di sala 2015'an de hilweşiyayî, albûmên kevn ên malbatê, tiştên ku tên bîra jinên malbatê û tiştên ku ew naxwazin bi bîr bînin tîne cem hev, dide li pey şopa lêgerîna Fatmayê ya wê bîranîna yekem.



fatmacelik459@gmail.com

Fatma Çelik

Di sala 1987'an de li Amedê ji dayîk bû. Ji Beşa Şêwirmendiya Derûnî û Rêbertiyê ya Zanîngeha İnönü mezûn bû. Ji sala 2009'an û vir ve li Amedê mamostetiya rêbertiyê dike û di saziyên sivîl de wek dilxwaz xebatên têkildarî zarok û jinan dimeşîne. Piştî ku di sala 2012'an de beşdarî ajansa fotografê ya NarPhotos bû xebatên wênekêşiya belgeyî û vîdeoyê yên derheqê mijarên wek koçberî, nasname, bîr, ekolojî û zayenda civakî pêk anî. Sala 2014'an di çarçoveya BAK de li gel Musa İrşi derhêneriya belgefîlma kurt a bi navê **Güvenli Bir Film** û li gel Aylin Kızıl jî derhêneriya **Bir Tribün Hikâyesi** kir.



Çemberekê Bîne Ber Çavên Xwe



Derhêner Fatoş Güneri
Vîdeo, 5’29’’, Reşemî 2021
Amed

Fatoşa ku di kolanên teng ên Amedê de rêya xwe winda dike bi falan hewl dide ku rêgeha xwe peyde bike. Her hevokeke falbêjan wê ber bi rêyekê ve dikişîne; nexwaze jî ew ê ji kolanên ku qet nas nake lê jê re binas xuya dikin derbas bibe. **Çemberek Bîne Ber Çavên Xwe (Bir Çember Düşün),** ya ku dengê falbêjên Amedê û dîmenên belgeyî yên kolanên bajêr digihîne hev, bîra şûnwarê zarokatiyê vedugerîne lêgerînekê û her wisa rewşeke meşandinê ye ku dawiya wê derdikeve ronahiyê.



fatossguneri@gmail.com

Fatoş Güneri

Di sala 1997'an de li Amedê ji dayîk bû. Di sala 2014'an de ji Lîseya Hunerên Bedew a Amedê, di sala 2020'an de jî ji Beşa Mamostetiya Wêneyê ya Zanîngeha Dicle mezûn bû. Li salên 2017 û 2018'an di qada vîdeo-art û enstelasyonê de beşdarî TÜYAP'ê bû. Di sala 2020'an de bi xebata xwe ya vîdeoyê mafê beşdarbûna BASE'ê bi dest xist. Ji sala 2017'an û vir ve beşdarî proje û kargehên cihê bû û di mijarên wek bajar, nasname, xwemalî, beden û jin de berhem dan. Bi awayekî çalak di qadên hunera rojane û hunera hevdem de berheman diafirîne.



Feza, Fehmi û Razên Bajêr



Derhêner Mediha Güzelgün
Vîdeo,11’47”, Reşemî 2021
Mêrdîn

Feza, Fehmî û Razên Bajêr (Uzay, Fehmi ve Şehrin Sırları), çîrokek e ku li şûna temsîldariya çîrokî ya Mêrdînê serpêhatiyeke fezayê datîne, paşeroj û pêşerojê li rastî hev tîne. Fîlm bi mêvandariya vebêjekî bi pêş ve diçe ku ew vebêj di wê baweriyê de ye ku keleha bajêr di rastiyê de keştiya Nuh e, Nuh keştiya xwe ne bi cinsê ajalan bes bi cinê mirovan tijî kiriye û li Mêrdînê lenger avêtiye, û bi vî awayî jî fîlm me bi Fehmî dide naskirin ku belkû jî Nuh bi xwe ye. Fehmîyê ku li gor vebêj jidil dixwaze biçe fezayê, belkû jî hema ji fezayê hatiye...




medihaguzelgun@gmail.com

Mediha Güzelgün

Di sala 1991'an de li Mereşê ji dayîk bû. Ji sala 2015'an vir ve li Mêrdînê mamostetiya polê dike. Di Beşa Sêwirana Ragihanê ya Zanîngeha Mardîn Artuklu de di qada Sêwirana Grafîkê de xwendina xwe ya lîsansa bilind didomîne. Di qadên wênekêşî, mîrasa çandî, leyîzên gelêrî, drama û erbaneyê de perwerde dîtiye. Bala wê li ser qadên wek wêje, tenîs, amûrên birîtm, sêwirana grafîkê, vîdeo, hunera mangayê, mîrasa çandî, muzegerî, bîr, berhevkarî, sînema û rêwîtiyê ye.



Kevir û Av



Derhêner Nalin Acar
Vîdeo, 5’14’’, Reşemî 2021
Elîh

Heskîfa ku li bin ava Bendava Ilısu maye êdî bi tenê bûye nexşek li ser dîwarê hewzeke li Êlihê. Ew hewz jî her wekî Heskîfa dîrokî ekosîstema xwe diafirîne. **Kevir û Av (Taş ve Su),** dîmenan bi têgehan ve têkildar dike, bi peywenda dîmenên cihê dîsa vedigere li ser heman têgehan û wisa bi pêş de diherike, û her ku bîneran vedixwîne ji nû ve temaşekirinê û têgihîştinê, giraniya şahidbûnê jî dest nîşan dike.



nalinacar29@gmail.com

Nalin Acar

Di sala 1994'an de li Êlihê ji dayîk bû. Ji Beşa Pîlansaziya Bajar û Herêmê ya Zanîngeha Hunerên Bedew a Mimar Sinan bi teza xwe ya lîsansê ya li ser temsîldariyên mekanê di sînemaya Kurdî de mezûn bû. Di navbera salên 2016-2019'an de di Kolektîfa Sînemayê ya Mezopotamya de xebat meşandin. Di sala 2019'an de li gel Adar Taş kurtefîlma bi navê **Rojek Ji Rêzê (Sıradan Bir Gün)** çêkir û li Kargeha Eurasiadoc Amed li gel Sevgi Şahin û Adar Taş senaryoya bi navê “Çatının Tozu” nivîsî. Ji 2016'an vir ve di saziyên sivîl de xebatên têkildarî bajar, mekan û sînemayê dike.



Nisêbîn, 4 Berfanbar 2020



Derhêner Rozerin Tadik
Vîdeo, 4’13’’, Reşemî 2021
Amed

Li nav bi hezaran malên hilweşiyayî ku li pevçûnên bajarên Kurdan ên di navbera salên 2014-2016'an de qewimîn mala kalikê Rozerînê jî hebû ku ew li gel xwişk û bira û pismaman bi tevahî 11 kes li wê derê ji dayîk bûbûn û mezin bûbûn. **Nisêbîn, 4 Berfanbar 2020 (4 Aralık 2020, Nusaybin)** bi axaftineke telefonê ya li şaneşîneke avahiyên pêkveyî yên ku piştî hilweşînan li heman deverê hatin çêkirin, dibe serlêdanek kurt a li bîranînên zarokatiyê yên du dotmaman.



tadikzerrin@gmail.com

Rozerin Tadik

Di sala 1995'an de li Nisêbînê ji dayîk bû. Ji beşa Ziman û Wêjeya Îngilîzî ya Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl mezûn bû. Ji bo demeke kurt mamostetiya zimanê Îngilîzî kir. Piştre dest bi karê fîkseriyê kir. Niha li Enstîtuya Lêkolînên Siyasî û Civakî ya Amedê wek kordînatorê ragihanê dixebite. Ji sala 2018'an û vir ve bi wênekêşiyê re mijûl dibe. Xebata wê ya wênekêşiyê ya bi navê “Yılmayan Şehir” di sehrebak.org de di pêşengeha navtorê “Sıradanın Gücü” de cih girt.



Cûdîyê Miradan

Derhêner Semiha Yıldız
Anîmasyon, 6’32”, Reşemî 2021
Amed

Cûdîyê Miradan, bi hîs û hêmayên bîranîneke zarokatiyê ya derbarê Cudîyê dest bi kar dike, herikîna sirûştî ya çar demsalan li Cûdîyê û encamên pevçûnên ku destlêwerdana wê herikînê dikin di heman de dinirxîne. Çiyayek ku wargehê çendîn cure kulîlkan, bizinan û mêşên kovî ye û wisa tê hêvîkirin ku xwestekan bi cih tîne lê bi dehan salan e bi zimanê yên din navê wê hatiye sazkirin, fîlm hewl dide ku vê carê ji nav wê erdnîgariyê, bi dengê sirûştê navê wê saz bike.



smha.yildiz@gmail.com

Semiha Yıldız

Di 1994'an de li Şirnexê ji dayîk bû. Ji Beşa Mamostetiya Kompîtir û Teknolojiyên Hîndariyê ya Zaningeha İnönü mezûn bû. Ji 2016'an û vir ve bala wê li ser anîmasyonê ye û karên bi vî rengî dike. Di Zarok TV û Erkam Animation de wek anîmator xebitî. Di Botan International de karên hilberîna naverokê ya medyaya civakî û danasînê dimeşîne.



Li Vir



Derhêner Sibel Öğe
Vîdeo, 6’31’’, Reşemî 2021
Elîh

Bi **Li Vir**'ê em gav davêjin nav qada beton ya ku ji Salona Sînemaya Yılmaz Güney a Batmanê bi şûn de maye, ku ji sala 2005'an vir ve mazûvaniya bi sedan fîlm, leyîz, konser û hevpeyvînan kiribû û beriyê şewitî û piştre jî hat hilweşandin. Ev valahiya beton ya di rewşa bendêmayînê de, her ku dengên paşerojê tijî tê de dibin, vediguhere mekanekê. Bi bîranînên vê mekanê û çanda ku tê de hatiye parvekirin dengên kolanê êdî nayên bihîstin, û hêza afirînê, bihevrebûnê, piştgiriyê û parvekirinê niha û li vir me dixe bin bandora xwe.



Sibel Öğe

sibeloge_72@hotmail.com

Di sala 1991'an de li Êlihê ji dayîk bû. Ji Beşa Şêwirmendiya Derûnî û Rêbertiyê ya Zanîngeha Ege mezûn bû. Ji sala 2014'an ta 2017'an li Şirnexê û ji sala 2017'an û vir ve jî li Êlihê wek şêwirmenda derûnî ya dibistanê dixebite. Endama desteya rêveberiyê ya Komeleya Çand û Hunerê ya Batmanê ye û di çarçoveya xebatên komeleyê de li sala 2020'an karê alîkariyê yê kargeha belgefîlm û vîdeoyê ya bi navê “Yerinden Edilenler” pêk anî. Di çarçoveya vê kargehê de, li gel Barış Eviz derhêneriya belgefîlma **Xwezî Ev Xewn Be û Ez Jê Şiyar Bim** (2020) kir. Her wisa di fîlma**Veşartok** (2020) de alîkarê rejî bû.



Eşêfçî, Xewn û Pincar



Derhêner Zelal Sadak
Vîdeo, 5’21’’, Reşemî 2021
Amed

Kî wan jinan bi bîr tîne ku pincarên li deverên tu kesî tov nereşandî, av nedayî, bi çîtan şûreyên erdê kifşenekirî berhev dikin? **Eşêfçî, Xewn û Pincar (Aşefçiler, Rüyalar, Otlar)** nebûna îro ya jinên eşefçî, ku navê sûka navdar a li Sûrîçî ya Amedî ji wan tê, bi koroyeke pirdengî ya pistepistan tijî dike. Ronahiya Baxçeyên Hewselê ku eşefçî pincarên xwe li wê derê berhev dikin dikeve li ser dîroka sûkê ya ku hatiye veşartin.



zelalsadak01@gmail.com

Zelal Sadak

Di sala 1991'an de li Amedê ji dayîk bû. Ji Beşa Zanistên Siyasetê û Rêveberiya Gelemperî ya Zanîngeha Dîcleyê û ji Beşa Teknîkeriya Laboratuvara Tibî ya Mardîn Artuklu mezûn bûye. Li Nûnertiya Amedê ya Weqfa Mafê Mirovan ya Tirkîyeyê dixebite. Di Rêxistinên Saziyên Sivîl ên têkildarî mafan de bi dilxwazî xebatan dimeşîne. Di projeya derbarê bîra civakî û mekan de ku li Amedê pêk hat û piştgiriya Komeleya Friedrich-Ebert-Stiftung wergirt, wek lêkolîner û vebêj kar kir. Di çarçoveya projeya bi navê Görüntü-İnsan-Mekân a Kulûba Sînemayê ya Amedê de belgefîlmeke kurt çêkir ku tê de cih daye temayên wek xwemalî, mekan, koçberî û jin.

DİYARBAKIRSANATMERKEZİ

ANADOLU KÜLTÜR

INSTITUT FRANÇAIS
Turquie